
Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
www.ronahi.net/ku/ Jimar :899 19-Îlon- 2021 Rojnameya siyasî, civakî û çandî

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/
nameronahi@gmail.com
423165

## Bersiva jimara borî

| | 1 | 2 | 3 | 4 | 5 | 6 | 7 | 8 | 9 |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 1 | T | A | ■ | D | O | ■ | A | L | A |
| 2 | ■ | B | A | ■ | F | Î | L | ■ | B |
| 3 | K | O | V | Î | ■ | D | E | B | Î |
| 4 | Û | R | ■ | N | A | ■ | M | A | S |
| 5 | P | Î | R | ■ | P | Z | ■ | B | ■ |
| 6 | ■ | N | ■ | S | Î | ■ | L | E | H |
| 7 | S | A | N | S | K | R | Î | T | ■ |
| 8 | A | S | A | ■ | O | ■ | M | ■ | R |
| 9 | R | ■ | L | A | ■ | P | A | P | A |

## Xaçepirs



### ÇEP-RAST

1. Li hin cihan beramberî heşt û li hin cihan jî beramberî şazdeh olçekan e... Şaxên nebatên weke zebeş, petîx, kundir hwd. yên li ser erdê
2. Îşaret, şop... Edalet
3. Parsûyên masiyan... Alet, pêdivî
4. Beyreq, sembola welatan... Baneşana keserê
5. Di dîrokê de dewleteke Kurdan... Dara tirî
6. Notayek... Teref
7. Daçekek... Kurteya rêxistina rizgariya Îrlanda... Rojek
8. Xwarina sereke... Cihê ku çûk û teyr lê datînin
9. Heşt caran deh, ji heftê û nehan yek zêde... Paytexta Sûriyê


### JOR-JÊR

1. Kesê ku diçe serdanê
2. (Rustemê …) Destaneke me... Bajarekî me
3. Ew nijadê spî yên ku tê bawerkirin ji kurê Hz. Nûh Sam peyde bûne; wekî kesê ku bi erebî, ibranî, asûrî û hebeşî diaxivin... Cihê heranê
4. Ji vir û şûn de, ji niha pê ve... Nalîn
5. Notayek... Mehek
6. Pêvedana bi hesinekî sincirî... Bêzar û bêziman
7. Notayek... Kar û xebat
8. Heskiriya Derwêşê Evdî... Pêxemberek
9. Bajarekî me

## Quncika Têgînan

| | |
|---|---|
| Astronomî (Fransî) | (Zanist) Stêrnasî, zanista stêran, lêkolînên zanistî li ser stêran li asîman |
| Astronot (Fransî) | Kesê/a bi kêştiyên esmanî li valagehê digere. Kozmonot, ezmanger |
| Astronman (Fransî) | Ezmannas |
| Dîplomasî (Fransî) | 1. Peymanên têkiliyên navneteweyî saz dikin. 2. Li welatekî biyanî û di civînên navneteweyî de karê yan jî hunera nûnertiya welatê xwe. 3. Erk û pîşeyê kesê di vî karî de dixebite. 4.Şandeya ji van kesan pêk tê. |
| Dîplomat (Fransî) | 1.Kesê bi siyaseta derve re mijûl dibe û ji bo welatê xwe hatî erkdarkirin. |
| Emperyalîzm (Fransî) | Siyaseta ku bi darê zorê welatê xwe dike serdestê welatên din. Mêtinkarî |
| Emperyalîst (Fransî) | Hêza ku xwediya fikra emperyalîzmê ye |
| Misyon (Fransî) | 1.Erk. 2.Armanc. 3.Saziya erkekî dînî, zanistî yan jî dîplomatîk girtî ser milê xwe ya ji çend kesan. |
| Misyoner (Fransî) | Kesê bi belavkirina dînekî, bi taybetî Xiristiyaniyê hatî erkdarkirin |
| Propaganda (Îtalî) | Xebata ji bo danasîn, ecibandin û belavkirina fikrekê yan baweriyekê bi gotin, nivîs yan rêbazên cuda |

## Peykerê hêştirê yê li Erebistana Siûdî temenê wê bi kêmayî 7 hezar sal e



**Peykerê hêştirê li bakurê Erebistana Siûdî hat keşifkirin, hat tesbîtkirin ku temenê wê bi kêmayî 7 hezar sal e.**

12 peykerên bi şêweyê rolyef yên li çolistana Cevf hatîn dîtin, fîgûrên rastî yên lawiran temsîl dikin. Arkologan di sala 2018'an de texmîn kir ku xetên van peykeran yên ewilê ne.

Pişt re Wezareta Çandê ya Siûdî, Ensîtûtiya Zanista Dîroka Mirovan ya Max Planck ya Elman û Navenda Lêkolînên Zanista Netewî ya Fransa (CNRS) ji bo dîroka peykeran diyar bikin, dest bi bernameyeke lêkolînê kirin.

Mirovên zaynar diyar dikin ku xêzên peykeran digihin BM 6 hezar salan amûrên kevir hatine bikaranîn, wê demê li qadeke daristan yan jî pêşberî eywanekê ya ber golan hatiye bikaranîn. Herêma mijara gotinê îro bûye çolistan.

Nivîskarên di nava xebatên Journal of Archaeological Science de cih digirin diyar dikin ku ev 'Hunera kevir û dîsa çkerên kevir yên mezin yên binavûdeng yên nakurê Erebistanê yên dema beriya dîrokê hatine avakirin' weke mînakekê dide nîşandan.

Li gorî lêkolînan, ji bo qulkirina keviran, avakirina şeklê wê û xebatên ku amûrên kevir yên 15 kêlometre dûr anîn, dibe xebatekî kolektîf yê parçeyek ji rîtuela salane ya civaka Neolotîk be.

## NY: Wê derdor ji bo mafê mirovan bibe 'pirsgirêka herî mezin'




**Komîseriya Bilind ya Mafê Mirovan ya Neteweyên Yekbûyî (NY) Mîchelle Bachelet, diyar kir ku eger gefên li ser derdor zêdetir bibin, hişyariya ku wê li cîhanê 'pirsgirêka mafê mirovan ya herî mezin' pêk bê, da.**

Komîseriya Bilind ya Mafê Mirovan ya NY Mîchelle Bachelet di daxuyaniya xwe ya li Cinêvê dayî de, hê ji lûtkeya COP26'ê re nêzî 2 meh mayî, ji bo derdor ketina nava tevgerê bang kir. Bachelet got, nediyariya herî mezin, wê siyasetmedar çi bikin."

Bachelet diyar kir ku qirêjî, guherîna avhewayê û cihêrengiya bîyolojîk yekbûna krîzan û 'şer, alozî û neliheviya çêkerî' berfireh bûne.

Komîseriya Bilind ya Mafê Mirovan ya NY Mîchelle Bachelet got, bandora li ser xwerek, av, perwerde, sitirîn, tenduristî û pêşketinê heye. Qirêjî jî bi tena serê xwe li gelemperiya cîhanê ji mirina pêşwext ya şeşan berpirs e."

Wê di lûtkeya COP15 ya navîna Cotmehê li Kûnmîng ya Çînê û dawiya meha Cotmehê ya lûtkeya COP26 ya ku wê li Glasgowê bê kirin, ev mijar bê nirxandin.

ANF

Pişt re Wezareta Çandê ya Siûdî, Ensîtûtiya Zanista Dîroka Mirovan ya Max Planck ya Elman û Navenda Lêkolînên Zanista Netewî ya Fransa (CNRS) ji bo dîroka peykeran diyar bikin, dest bi bernameyeke lêkolînê kirin.

Mirovên zaynar diyar dikin ku xêzên peykeran digihin BM 6 hezar salan amûrên kevir hatine bikaranîn, wê demê li qadeke daristan yan jî pêşberî eywanekê ya ber golan hatiye bikaranîn. Herêma mijara gotinê îro bûye

## Tûrikê Çîvanokan

***Kesê berdêla mûçeyekî diyar pezê gund diçêrîne jê re tê gotin şivan. Berê li gundan gundiyan serê bizinê yan serê miyê dirav didan şivan. Li deverna jî digotin emê salê evqas dirav bidin te. Li gelek deveran hemsera şivan her êvar malbimal digeriya. Her malê nanek û çend kevçik xwarin didanê. Wê jî xwarina hişk tev dixist firaxekê, ya rohn jî dixist firaxekê.***

### ŞIVAN

Lo şivano şivano şivano
Şivano bilûrvano

Şivanê pezê reş e
Lo şivano şivano

Deşt û çiya dimeşe
Şivano bilûrvano

Dengê bilûrê xweş e
Lo şivano şivano

Pel ji xweşî diweşe
Şivano bilûrvano

Pez nebe ser kaniya
Lo şivano şivano

Gur derketye baniya
Şivano bilûrvano

Şivanê berx û miya
Lo şivano şivano

Mî berdane nav giya
Şivano bilûrvano

Pez nebe bin hêjîrê
Lo şovano şivano

Gur derketye nêçîrê
Şivano bilûrvano




## Ti kes nikare koka me rake!



Ne çanda me tenê ye, ev çanda jinên Kurd e jî em bi hev re lê xwedî derdikevin. Ji ber ku em ji berê ve bi hev re dijîn, vê bandor li cilûbergên me jî kiriye. Çandeke me ya hevpar heye. R-7


## Kuştina jinê kuştina jiyanê ye



Divê cezayê herî giran li sûcdarên kuştina jinan were birîn, da ji cîhanê re bibin mînak. R-3

Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
www.ronahi.net/ku/ Jimar : 899 19-Îlon- 2021 Rojnameya siyasî, civakî û çandî

## 'Şehîdên têkoşîna azadiyê nemirin'



Serê sibehê xwe amade dike ku biçe karê xwe. Xatir ji dayîka xwe dixwaze û ji malê derdikeve. Piştî ku derdikeve li taxê dayîk li kurê xwe temaşe dike û dibêje, 'tu çiqas xweşikî kurê min'. Lê dayîk nizane ku cara dawî ye li bejna kurê xwe temaşe dike. R-6

## Komîteya Hundir ya Dêrazorê: Divê xelk guh nede gotegotan

Hevserokê Komîteya Karûbarên Hundir ya Dêrazorê diyar kir ku piştî bi saya Hêzên Ewlekariya Hundir û QSD'ê aramî û ewleyî li seranserî Dêrazorê misoger bû, jimara bendên kontrolê hat kêmkirin û bang li şêniyên Dêrazorê kir ku guh nedin gotegotan. R-2




## Li hundir celadê gelê xwe ye, li derve jî xulam e

Ji 23yê Nîsanê ve dewleta tirkî ya dagîrker bi armanca dagîrkirina başûrê Kurdistanê êrişê Herêmên Parastinê yên Medya dike. Herwiha PDK jî şûna ku li dijî van êrişan xwedîhelwest be, bi şêweyekî fermî heta roja me ya îro jî van êrişan rewa dike û ew jî bi artêşa tirkî re êrişî cihên gerîla dike. R-3







# DÎROK WÊ JI PDK Û ENKS'Ê HESAP BIXWAZE

## 'Kompoya 15ê Sibatê, bi tecrîd û êrişên qirkirinê didome'



Têkildarî tecrîda girankirî ya li ser rêber Ocalan û girêdana wê ya bi êrişên dewleta tirkî ya dagîrker ve yên ser başûrê Kurdistanê, endamê Desteya Rêveber ya PYDê Ehmed Şêxo bi rojnameya me re axivî. R-4


## PKK: Dewleta tirkî û nokerên wê hevalê me Yasîn Bulut kuştin

PKK'ê bi daxuyaniyekê diyar kir ku dewleta tirkî hevrêyê wan Yasîn Bulut (Şukru Serhat) bi rengekî hovane kuştiye. PKK`ê bang li partî û kesayatan kir ku helwesta xwe nîşan bidin. R-5




## PDK Û ENKS WÊ PIŞTÎ XIYANETÊ ÇI BIKIN?

Çalakvanên jin: PDK bi hewlest û hevakriya bi dewleta tirkî ya dagîrker re, xiyanetê li gelê xwe dike. Banga ENKS'ê jî rewakirina dagîrkeriyê ye û ji aliyê MÎTa tirkî ve ev bang hatiye plankirin. R-4





**Edalet!**
Sîpan Şînda R-7

**Li Sûrî çi diqewime?**
Farûk Sakik R-6

**Bê vîna gelan çareserî ne pêkan e**
Idrîs HENAN R-5

# Komîteya Hundir ya Dêrazorê: Divê xelk guh nede gotegotan

Hevserokê Komîteya Karûbarên Hundir ya Dêrazorê diyar kir ku piştî bi saya Hêzên Ewlekariya Hundir û QSD'ê aramî û ewleyî li seranserî Dêrazorê misoger bû, jimara bendên kontrolê hat kêmkirin û bang li şêniyên Dêrazorê kir ku guh nedin gotegotan.



Hevserokê Komîteya Karûbarên Hundirî ya Dêrazorê, Basim El-Letîf da xuyakirin ku piştî zêdebûna operasyonên ewlekariyê yên hevbeş, di navbera Hêzên Ewlekariya Hundir û Hêzên Sûriya Demokratîk (QSD) de li herêmên cuda yên Dêrazorê û girtina gelek şaneyên DAIŞ`ê komîteyê biryar da ku jimara bendên kontrolê kêm bike.
Basim El-Letîf da zanîn ku operasyonên ewlekariyê dewam dikin û Hêzên Ewlekariya Hundir her tim amade ne ku şaneyên DAIŞ'ê bigirin.
El-Letîf da xuyakirin ku gotegotên ku hin dezgehên ragihandinê derbarê ketina hêzên Rûsya û hêzên hikumeta Şamê ya Dêrazorê de belav dikin, ne rast in û got, armanca wan belavkirina fitneyê di nava gel û hêzên ewlekariyê û leşkerî de ye.
El-Letîf got, divê şêniyên Dêrazorê guh nedin gotegotan û baweriya xwe bi hêzên xwe yên ewlekariyê û leşkerî xurtir bikin.
*ANHA*

## Bijîşk derbarê xetera korona de gel şiyar dikin


***Bijîşkekî nexweşiyên singê bang li welatiyan kir ku xwe ji vîrûsa korona biparêzin û li ser belavbûna bilez ya pêla çaran şiyarî da.***

Digel ku gelek cureyên derziyên antîvirûs derketin, lê dîsa jî bi milyonan welatî bûn gorî û welatên cîhanê nikarin rê li belavbûna korona bigirin.
Li gorî daneyên dawî, heta niha li cîhanê 219 milyon kes bi vîrûsê ketine û ser 4 milyon kesî re mirine. Li herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê jî heta roja Pêncşemê, 32 hezar û 285 kes bi vîrûsê ketine, 812 kes mirine û 2 hezar û 26 kes jî baş bûne.
Rêbaza yekane ya xweparastina ji vîrûsê ew e ku welatî li gorî tedbîrên aliyên tenduristiyê tev bigerin, dûrî kombûnê bikevin û li paqijiya xwe baldar bin.
Lê dîsa jî şêniyên bajarê Qamişlo li gorî tedbîrên tenduristiyê tev nagerin û li sûkan tijî ne.
“ Em îro dûr bikevin da sibe em bicivin “
Rêzan Mihemed ku li bazara Qamişlo digeriya û tedbîrên xweparastina ji vîrûsa korona bi cih anîbû, wiha axivî: “Digel ku bi milyonan kes bi vîrûsê mirine û nexweş ketine, dîsa jî gelek welatî dibêjin vîrûs nîne. Lê bi rastî divê em li tenduristiya xwe miqate bin û xwe biparêzin. Eger me xwe parast, emê malbat û civaka xwe jî biparêzin. Em îro dûr bikevin da ku sibê em li hev bicivin.”
Rêzan Mihemed axaftina xwe wiha domand: “Ya baş em maskan bidin ber devê xwe, lewra me ji vîrûsê diparêzin. Eger nexweşî bi me re jî hebe, kesên derdorê ji xetera vîrûsê diparêzin.” Mihemed bang li welatiyan kir ku maskan bidin ber devê xwe, li paqijiya xwe miqate bin û heta ji destê we were dûrî kombûnan bikevin.
Welatiya bi navê Buşra Ubêd jî bang li welatiyan kir ku dûrî kombûnan bikevin û wiha axivî: “Divê welatî zêde bi kesên derdora xwe re nedin û nestînin, tedbîrên şexsî û paqijiyê pêk bînin da ku xwe ji vîrûsê biparêzin.”
“ Kombûn sedemek ji sedemên belavbûna vîrûsê ye “
Têkildarî tedbîrên ku divê welatî li gorî wan tev bigerin, welatiyê bi navê Ilyas Kirîvo wiha axivî: “Em bi maskan xwe diparêzin û dema vedigerin malê jî, her tim destên xwe bi avê û sabûnê dişûn.”
Îlyas Kirîvo bang li Rêveberiya Xweser kir ku bi reklam û belavokan welatiyan hişyar bikin.
Herwiha bang li şaneya aloziyê kir ku kombûnan qedexe bike û bang li welatiyan jî kir ku xwe biparêzin û dema danûstandinê bi kesên derdora xwe re bikin, dûrî hev bisekinin.
“ Ev pêl zû belav dibe “
Têkildarî cudayiya vê pêlê ji pêlên din, Dr. Sead Hiso yê nexweşiyên hundir û singê ev agahî dan: “Eger mirov vê pêlê bi pêlên din re hevrû bike, mirov dibîne ku nîşanên wê heta astekê li ser menfesê û singê sivik e, lê bandorê li rûviyan dike û wisa dike ku hestî biêşin û laş jî sist bibe.”
Hiso da zanîn ku pêla çaran zêde di nav welatiyan de belav dibe, nexasim di nava zarokan de û wiha dewam kir: “Nîşanên ku çêdibin; verişîn, koxikeke sivik, navçûn, lê cudayiyek û taybetiyên nû yên vîrûsê nînin.”
Dr.Hiso têkildarî tedbîrên xweparastinê ev nirxandin kir: “Gelek gelên cîhanê tedbîrên qedexeya ku hikumetên wan ragihandine, red kirin, li dijî wê derketin û baweriya xwe bi tedbîran neanîn, lê dema nexweş ketin, pêk anîn.”
Hiso diyar kir ku çareya xweparastina ji vîrûsê, di lixwexistina derziyê de ye û ev lê zêde kir: “Têkiliyên min bi tevayiya bijîşkên li derveyî welat re hene, dibêjin jimara mirî û nexweşan piştî parzeyê kêm bûye, ev jî tê wateya ku sûdeke mezin ya derziyê digihe mirovên li xwe dixin.”
Cara yekê Çileya 2019`an vîrûsa Korona li Çînê derket û nîşanên wê jî ev in; ta, koxika ziwa, herikîna poz, iltîhaba qirikê, êşa serî û astengiyên di nefesstandinê de.
*ANHA*



## SOHR: Sotemeniya Îranê di ser Sûriyê re derbasî Lubnanê dibe

***SOHR`ê ragihand ku kamyon û sahricên sotemeniya Îranê, ji Sûriyê derbasî Lubnanê bûne.***



Kamyon û sahricên tijî sotemeniya Îranê ji Sûriyê derbasî Lubnanê bûn. Di çend rojên dawî de, sotemeniya ji Îranê hatî, li bendera Benyasê dihat valakirin. Pişt re derbasî Himsê hat kirin ku di binê kontrola Hizbullaha Lubnanê de ye.
Li gorî Navenda Çavdêriya Mafên Mirovan ya Sûriyê (SOHR) Firqeya 4`an riya veguhestina kamyonan parast da bi hêsanî derbasî Lubnanê bibin.
*ANHA*

## Li Hecînê şehîdên mehên Îlon û Tebaxê hatin bîranîn

**Meclisa Malbatên Şehîdan li bajarokê Hecînê yê Dêrazorê ji bo bîranîna şehîdên meha Tebax û Îlonê merasimek organîze kir.**



Nûnerên Meclisa Sivîl, meclisên herêmî yên gundewarê rojhilatê Dêrazorê, welatî û malbatên şehîdan tevlî merasimê bûn.
Hevserokê Meclisa Malbatên Şehîdan Ebdulxenî El-Lohî di axaftina xwe de behsa fedakariya şehîdan kir. El-Lohî diyar kir ku ku şehîdan ji bo azadî û jiyana birûmet, xwe feda kir, ji ber wê şehîd pîroz in.
Bi navê Meclisa Leşkerî ya Dêrazorê Şemlan El-Şemlan jî diyar kir ku şehîdan hêvî da wan û ji fedakariya şehîdan hêzê digirin.
El-Şemlan soz da ku riya şehîdan bişopînin heta ku azadî û jiyaneke birûmet mayînde bikin.
Serokê Meclisa Partiya Sûriya Paşrojê ya Dêrazorê Mihemed El-Şeban jî ev nirxandin kir: “Em bejna xwe li hemberî tevayiya şehîdan ditewînin. Lewra ji bo ku em di ewleyiyê de bijîn xwe feda kirin.”
Şehîdên hatîn bîranîn, navên wan wiha ne: Şeban Mihemed El-Zayid, Yûsif Sewadî El-Ferîh, Mistefa Meloh El-Deram, Nesîm Salih El-Dode, Ebid Rîkan El-Salih, Ebdlkerîm El-Salih, Mihemed Seîd El-Henzel, Tirkî Iz El-Dîn El-Ewed û Elî Hamid El-Ceda.
Di dawiya merasimê de li pêşiya wesîqeyên şehîdan ji aliyê malbatên wan ve find hatin pêxistin.
*ANHA*



## HAT`ê li Dêrazorê serçeteyekî DAIŞ`ê girt

**Hêzên Ewlekariya Hundir bi operasyoneke serdegirtinê li bejayiya Dêrazorê serçeteyekî DAIŞ`ê girt û çek û alavên pê re desteser kirin.**

Hêzên Ewlekariya Hundir ya bakur û rojhilatê Sûriyê têkildarî mijarê daxuyaniyeke nivîskî da û da zanîn ku 15`ê Îlonê, hêzên taybet (HAT) yên girêdayî wan bi hevkariya Koalisyona Navneteweyî bi ser cihê serçeteyekî rêxistina DAIŞ`ê ya terorîst ya herêma Dêrazorê girtine.
Hêzên Ewlekariya Hundir di dewama daxuyaniyê de wiha got: “Hêzên me yên taybet (HAT) bi hevkariya Koalisyona Navneteweyî li bajarokê El-Şehîl yê bejayiya Dêrazorê serçeteyekî DAIŞ`ê ku karê leşkerkirinê di nava rêxistina DAIŞ`ê ya terorîst de dikir, girtin. Hat piştraskirin ku ew seçrete beşdarî kiryarên terorîstî bûye û karê şaneyên terorîst hêsan dikir û plansaziya operasyonên kuştinê dikir.”
Di daxuyaniyê de hat gotin çek û avalên ji bo çandina mayînan û kuştinê yên bi serçete re, hatine desteserkirin.
*ANHA*





# *Ti kes nikare koka me rake!*

Ne çanda me tenê ye, ev çanda jinên Kurd e jî em bi hev re lê xwedî derdikevin. Ji ber ku em ji berê ve bi hev re dijîn, vê bandor li cilûbergên me jî kiriye. Çandeke me ya hevpar heye.Dengê mirovan jî bûye bingehê dîtina amûrên mûzîkê.

Jinên Ereb, nexasim yên temenmezin, çanda xwe ya cilûbergên gelêrî diparêzin. Ji berê ve jinên Ereb di çêbûna bûyereke bi êş yan xemgîniyekê de, cilên reş ku ji kiras û hebarî pêk dihat, li xwe dikirin. Hinek dayîkan jî di dilê xwe de sond dixwar ku heta mirinê li xwe bikin. Cilûbergên Ereban jî ji kiras ango zibûn û hebarî pêk tên. Cemîla Hatim ya ji Til Temir ya Kantona Hesekê ya bakur û rojhilatê Sûriyê, 65 salî ye. Ew heta vê kêliyê jî li cilûbergên xwe yên gelêrî xwedî derdikeve. Di heman wextê de jî Cemîla jineke dengbêj e û dengê wê yê zelal yê ji nava dilê wê, weke zengil e.

**Her qermîçok bi dehan serhatî ne**

Cemîla bi hesreta rojên berê dibêje, me ji çinîn û berhevkirina pembû û dagirtina bendekan dest pê kiriye, heta paleyiya genim bi dasan, xwedîkirina pez, çêlek û mirîşk û gelek karên gundan û li nava erdan me dikirin û em bi westana xwe jî nedihesiyan. Berê û niha jî ez barê xwe navêjim ser ti kesî, her ez barê xwe hildigirim û xwedî li xwe derdikevim û ti carî hêza xwe ji zilaman nagirim. Ji ber ku niha jin di her warî de pêşengiyê ji civakê re dikin. Jin nifşan hemûyan perwerde dikin û aboriya civakê birêkûpêk dabeş dikin, pergala parastinê ava dikin. Hûn van qermîçokên rûyê min dibînin? Ev keda bi dehê salan e. Ev qermîçok şahidiya gelek êş, azar, ked û têkoşîna min dikin. Her qermîçok, bi dehan serhatiyên veşartî, nexasim yên xizaniyê û şer dibêjin.”



**Hebarî çanda jinên Kurd e jî**

Cemîla wiha behsa cilûbergên gelêrî yên jinên Ereb dike: “Her netewe bi cilûbergên xwe yên gelêrî tê nasîn. Jinên Ereb jî bi kiras ango zibûn û hibriya li dora serê xwe, tên nasîn. Ev çand heta niha heye, lê nifşên nû, kêm xwedî li vê çandê derdikevin û modeya kapîtalîzmê bandorê li wan dike. Berê şermeke pir mezin bû ku jin bê zibûn li bejna xwe bikin û hibriyê bidin serê xwe, derkevin derve. Lê ne çanda me tenê ye, ev çanda jinên Kurd e jî, em bi hev re xwedî li vê çandê derdikevin. Ji ber ku em ji berê ve li herêmê bi hev re dijîn, vê yekê bandor li cilûbergên me jî kiriye. Çandeke me ya hevpar ya cilûberg, amûr û tiştên din heye.”

‘Va ye, ya şawî hat’

Cemîla behsa çûna xwe ya ber bi Lubnan, Humis û Tertûsê ve dike û wiha dibêje: “Ez berî niha çûm Lubnanê, zêdetirî 10 salan li wir mam û em li wir dixebitîn. Li wir min cilên xwe neguhertin. Çawa ez rêzê ji cilên wan re digirim, divê ew jî rêzê ji çanda min re bigirin. Dixwestin ez çebonekî dirêj û kenzeyekî bi ser de li xwe bikim û wisa derkevim, lê min ev qebûl nedikir. Ji ber wê gotinên sivik ji min re digotin, carê digotin ‘Va ye, ya şawî hat.’ Şawî jî bi maneya, ya ji dinyayê tiştekî fêm nake ye. Tevî ku ez li Humis û Tertûsê jî mam, min cilûbergên xwe yên gelêrî neguherandin û rojekê jî ji wan dûr neketim.”

**Dengê bilûra wê li çiyan bilind dibû**

Cemîla di heman wextê de jineke dengbêj e: “Di civaka Ereb de, dengbêjî li pêş e, ji zarokan heta kal û pîran. Hemû xwedî dengê zêrîn in.
Dema ku ez 20 salî bûm, her li ser çiya û li newalan bûm, min pezê mala dayîka xwe diçêrand û şivantî dikir. Hingê min ji bedewiya çiyayan û xwezayê ilham digirt û li bilûrê dixist. Dengê bilûrê bi bilindbûna çiyayan re dibû yek û kela dilê min pir xweş radikir. Nexasim biharê, di nava xwezaya bedew de û dengê bilûrê, tiştekî pir cuda derdiket holê.”
Cemîla di dawiyê de wiha dibêje: “Şer bi ser me de bê sepandin jî, emê li ber xwe bidin. Em xwedî ruh in û ruhê me bi axa me re bûye yek û ti kes nikare koka me rake. Emê li çand û zimanê xwe xwedî derkevin û mayînde bikin.”
*JINHA*

# *Şanoya zarokan*

**Piştî şoreşa Rojava weke gelek mijaran şano jî pêş ket. Herwiha rojbiroj giringî ji bo beşa şanoya zarokan jî tê dayîn û di nava Koma Şano ya li Qamişlo de perwerdeya şanoya zarokan jî dest pê kiriye.**



Şano yek ji şaxên hunerê ye ku şanoger bi nivîsê wêje, şano û çîrokên şanoya xwe li ser dikê pêşkêşî temaşavanan dike. Ji ber zilm û zorê ku bi salan li ser gelê Kurd hatiye, wek şanoya kurdî di pir aliyên çandê de li paş maye. Li Rojava dema rajima Beesê desthilatdar, bi awayekî veşartî li malan şanoya kurdî dihat pêşkêşkirin. Çimkî şanoger bi zimanê dayîkê şano pêşkêş dikir, lê rêjima Be`esê ziman ji bilî zimanê erebî li Sûriyê qedexe kiribû. Ji ber wê bi şêwazekî veşartî ew şano di bekereyekê (kaset) de dihat tomarkirin. Pişt re xelkê Kurd bi dizî ev kaset dikirîn û lê temaşe dikirin. Piştî şoreşa Rojava sala 2011'an şanoya kurdî gavek pêş de avêt. Bi taybetî li Navenda Mihemed Şêxo gelek şano hatin pêşkêşkirin. Bi dehan komên şano hatin damezirandin. Di vê pêvajoyê de bi qasî tê xwastin şanoya zarokan pêş neketibût jî, hewldanên pêşxistinê yên girîng hene.
Derbarê mijarê de endama Rêvber ya Koma Şano Hemalîn Ferman got, sala 2014'an li bajarê Qamişlo Koma Şano hat damezirandin. Bi du kesan hat destpêkirin. Armanca me ew bû ku li Rojava em şanoya kurdî pêş bixin û şanogeran amade bikin. Herwiha şano bi civakê bidin danasîn. Bi taybetî şanoya zarokan. Çimkî ev beş li herêmên me qels e.
Li ser kar û xebata Koma Şano Hemalîn da zanîn ku, destpêkê perwerdeyên amadekirina şanogeran vekirine û bi dehan şagirt tevlî vê perwerdeyê bûne û wiha domand: “ 8 sal di ser damezirandina Koma Şano re derbas dibe, heta niha zêdetirî sed şanogerî gihandine. 40 kes endamên komê ne. Endam ji zarok û mezinan pêk tê. Heta niha 21 şano ku ji cureyên şano hemû pêk tê hatine pêşkêşkirin. Herwiha bi navkirina Koma Şano bi armaca ku cureyên şano hemû werin pêşkêşkirin e. Li gorî derftan hin şano li herêmên bakur û rojhilatê Sûrî pêşkêş kirine. Em salane 4 şanoyan pêşkêş dikin.”
Derbarê şanoya zarokan de Hemalîn diyar kir ku dest bi projeyeke nû ji bo fêrkirina zarokan kirina û wiha axivî: “Hezîranê me dest bi perwerdeya fêrkirina zarokan ji bo şano kir. Destpêkê li ser rûpelên medya civakî me ragihand. Li gorî derfetên me 15 zarok hatin qebûlkirin. Zarok heta sê heyvan tên perwerdekirin. Piştî ku perwerde bi dawî bibe, şagirt şanoyekê wê pêşkêş bikin û wê werin xelatkirin. Bi awayekî akademîk zarok perwerdeyê dibînin.”
Hemalîn da zanin ku perwerdeyên şano zanist û fikrê zarokan pêş dixe û ji wa re dibe perwerdeyeke jiyanî. Herwiha da diyarkirin ku şano zarokan ji tiştên xirab jî dûr dixe; bêhtir afrîner û bi xwe bawer dibin”.
Hemalîn axaftina xwe wiha domand”: Berî şoreşê şanoya kurdî hebû lê qels bû. Destpêka şoreşê şanoya kurdî gaveke li pêş avêt. Tevlî derfetê çêbûne ku kom ava bibin û şano pêş bikeve, lê mixabin ne ew pêşketina ku em dixwazin. Sedem gelek in hin jê siyasî û hin jê jî ku alîkariya koman nayê kirin. Mihrîcana yekê ya şano zêdetirî 35 komên şano yê Qamişlo tevlî bûn, lê niha em dikarin bêjin ku komek jî nîne.”
Hemalîn bang li gelê Kurd kir ku şanoya kurdî bêxwedî nehêlin û wiha dawî li axaftina xwe anî”: Banga min ji kesên berpirsyarên şano ew e ku li şano miqate bin. Peymangeheke taybet ji bo şano were vekirin û ew jî bibe yek ji şaxên zanîngeha Rojava. Tevî ku projeyeke me wiha hebû û me pêşkêşî desteya Perwerdeyê û ya Çandê kir, lê heta niha bersiv nehatiye dayîn. Bi taybetî nivîskarên me şano bikin erkek û çîrokên şano binivîsin. “



## Edalet!

Sîpan Şînda

Gelo dema navê “edalet”ê tê gotin çi tê bîra we? Em wek kes, çi wateyê li peyva “edalet”ê bar dikin? “Edalet”ê çi qedir û qîmet di kesayata me de heye? Em çi ji edaletê fêm dikin? Edalet, ango parastin û bicihanîna heqaniyetê. Gelo ka heqaniyet bixwe çi ye? Dema qala edaletê tê kirin, di halê de bûyerek yan jî qewimînek di navbera du yan jî zêdetir aliyan de heye û ji bo ku ev tişt jî bê çareserkirin kesên ku ji edaletê û hiqûqê fêm dikin hewl didin ku vê mijarê li gorî “heqaniyetê” bi awayekî “adil” çareser bikin. Di pêvajoya çareserkirinê de aliyên bûyerê bixwazin dikarin delîl û şahidên xwe pêşkêş bikin. Li gorî delîl û şahidan jî biryar tê dayîn. Dibe ku aliyek yan ji her du alî ne memnûn bin, lêbelê di taliyê de biryarek tê dayîn. Gelo ka ev biryar çi qeder li gorî “heqaniyetê” hatiye dayîn, ya girîng ew e. Di serî de hakimê herî mezin wijdana kesên ku biryarê didin e. Dema ew biryarê ne li gorî edaletê bidin, wijdana wan heta ku ew sax in di qirika wan re digire û nahêle ew hizûrê bibînin. Heke ew “heqaniyetê” li ber çavan negirin wê demê edalet bi cih nehatiye.
Gelo ev wijdan çawa pêş dikeve û mirov çawa dibe xwediyê wijdaneke adil? Eva hanê ji zarokî di malbatê de dest pê dike. Dema dê û bav zarokan mezin dikin, divê di wê pêvajoyê de edaletê nîşanî wan bidin û hîmê edaletê di kesayeta wan de bidin bicihkirin. Ji ber wê divê dê û bav di serî de di navbera zarokên xwe de adil bin û di vî warî de hestên wan yên edaletê neêşînin û neperçiqînin. Heke ew vê bikin, dema zarokên wan mezin jî bibin wê di vî warî de ji edaletê dûr bin û wê di biryarên xwe de heqaniyetê li ber çavan negirin. Ya duduyan, divê mamoste li dibistanan di vî warî de gelek hişyar bin û edaletê nîşanî xwendekaran bikin. Divê ew ne tenê bi gotinan, ya girîngtir ew vê yekê bi kiryarên xwe ji zarokan re bibin mînak û divê ew li himberî zarokan ferqanê nekin. Dema ew biryara jî didin divê ew bi awayekî berbiçav danin holê ku wan biryareke adil daye û vê ji zarokan re zelal bêjin.
Ya sisêyan, divê perwerde di vî warî de gelek pêşketî be û ji bo hestên xwendekaran yên edaletê pêş bikevin pêşengiyê bike û mînakên şênber dayne holê. Heke pergala perwerdeyê di vî warî de ne pêşketî be wê hestên edaletê jî di kesayeta nivşên nû de bi cih neke û ev jî wê ji bo civakê bibe pirsgirêk. Ya çaran, divê pergala dadgeriyê bi awayekî edaletê bi cih bîne hatibe avakirin. Nexwe heke pergala dadgeriyê ne li gorî edaletê hatibe avakirin, wê ti caran civak baweriyê bi pergalê neyne. Ev jî wê ji bo pêşketina civakê û demokrasiyê bibe astengiyeke mezin. Ya pêncan, divê kesên ku di nava civakê de xwedîgotin û rûspî bin biryarên xwe li gorî edaletê bidin, gotinên xwe li gorî heqaniyetê bêjin û di vî warî de ji civakê re bibin mînak.
Edalet, di nava civakê de yekîtiyê çêdike, girêdana di navbera civak û pergalê de xurt dike. Heke di nava civakekê de hestên edaletê pêş ketibin, ew civak wê ji bo mafên xwe û demokrasiyê pirtir bikare têbikoşe. Ji ber wê divê mirov li hemberî bêedaletiyê ti caran çavên xwe nenoqîne û xwe bêdeng neke. Heke mirov li himberî bêedaletiyê bêdeng bimîne, mirov şirîtiyê û bêheysiyetiyê jî li xwe digire.

# `Şehîdên têkoşîna azadiyê nemirin`

Serê sibehê xwe amade dike ku biçe karê xwe. Xatir ji dayîka xwe dixwaze û ji malê derdikeve. Piştî ku derdikeve li taxê dayîk li kurê xwe temaşe dike û dibêje, 'tu çiqas xweşikî kurê min'. Lê dayîk nizane ku cara dawî ye li bejna kurê xwe temaşe dike.

**Hediya HISÊN/Qamişlo**



Bi xwîna laşê xwe xaka welat av dan. Ji giyanê xwe bihatir nedîtin ku bikin goriyê azadiya gelê xwe. 12 hezar şehîd û 25 hezar birîndar ji bo parastina welat giyan û perçeyên laşê xwe kirin qurban. Bi xwîna xwe jiyaneke azad û aram ji gelê xwe re afirandin. Çawa ku welat di dilê wan de bû, bîranîna wan jî di dil û wijdana me de ye. Ji ber wê di vê raporê de em şehîd Luqman bîr tînin, ku 27'ê Temûza 2016'an di teqîneke terorîstî de li taxa Xerbî şehîd bû û da dû şopa hevalên xwe.

Luqman Ebdê 28'ê Îlona 1996'an li bajarê Qamişlo, di malbateke welatperwer de ji dayîk dibe. Zarokên malê ew û xwîşkeke xwe ne. Ji ber wê pir girêdayî hev û delalî ne. Ji ber xwendin bi zimanê erebî ye û axaftin bi zimanê kurdî qedexe ye, ji xwendinê hes nedikir. Dizaniya ku ew ne zimanê wî ye û ne dîroka gelê wî ye. Destpêka şoreşa Rojava (sala 2013'an) tevlî refên Asayişê dibe. 3 salan di Asayişê de kar û xebatê dike. Amadekariya xwe dike ku bizewice, lê di rojeke reş ya dîroka bajarê Qamişlo de (27'ê Temûza 2016'an) di teqînekê de şehîd dibe.

Dayîka şehîd Luqman, Semîra



Xelîl wiha behsa keseyeta kurê xwe dike: "Şehîdbûna Luqman birîneke bêderman e. Ji heval û zarokan pir hes dikir. Ez û wî weke du hevalan bi hev re bûn. Kesayeteke civakî û devliken bû. Ji rastiyê hes dikir, kesê gotineke ne rast digot, bi wan re nema diaxivî. Her dem di fikara hevalên xwe de bû. Dema temenê wî bû 18 tevlî refên Asayişê bû. Ev biryar ya wî bixwe bû û me jî bi kêfxweşî ev biryar qebûl kir. Piştî ku tevlî kar û xwebata têkoşina azadiyê bû, bandor li gelek xortên din yên malbatê kir û tevlî bûn. Çi cara vedigeriya malê ji bo ku firavînê bixwe, hevalên xwe jî bi xwe re dianîn."

Derbarê şehîdbûna wî de dayîka wî ev agahî dan: "Serê sibehê hê zû rabû û xwe amade kir da ku biçe karê xwe. Min jê re qehwe hazir kir. Qehweya xwe vexwar û derket. Berî ku derkeve min jê re got zû vegere malê. Çimkî dilê min ne rehet e. Piştî ku meşiya min ji metika wî re got, ka were û li bejna Luqman temaşe bike û min bi heyranî mêze bejna wî kir. Saet 9'an derket. Saet bû 9 û 20 deqe dengê teqînekê hat. Teqîn pir nêzî me bû. Ez bilez li telefona wî geriyam, lê bersiv neda min. Min ji hevalên wî yên li taxê pirs kir, lê ti kesî bersiva min neda. Êvarê ji me re gotin ew û du hevalê xwe yên Asayişê şehîd bûne.

**'BILA DIJMIN KEYFXWEŞ NEBE, HETA MIRINÊ WÊ TILIYA ME DI ÇAVÊ WAN DE BE'**

Dayîka şehîd Luqman teqîna li taxa xerbî şermezar kir û wiha axivî: "Ev teqîneke bi destê kesên faşîst û terorîst bû. Ev teqîn êşek e di dilê me de û şehîdbûna kurê min ji min re birîneke bêderman e. Lê bila keyfa dijminan li malbatên şehîdan neyê, heta mirinê wê tiliya me di çavê wan de be û emê li dû şopa şêhîdê xwe hê bihêztir têkoşîn bikin. Bi şehîdbûna kurê xwe ez ser bilind im. Min soz da ku heta dawiyê li dû şopa wî bim û kar û xebatê azadiyê bidomînim. Ez dengê xwe bilind dikim heta ku bigihe dawiya cîhan. Şehîdên têkoşîna azadiyê namirin! Wê bi azadiya gelê xwe re her tim bijîn.

Keça xalê şehîd Luqman, Emîna Dawid jî derbarê jiyana wî de wiha axivî: "Di malbatê de ez û Luqman hevalê hev bûn. Malbatê bi giştî jê hes dikir. Kesayeteke bi evîn, aşitî û giyanê şoreşgerî dihat naskirin. Luqman nayê jibîrkirin. Piştî ku şehîd bû 4 zarok di malbatê de ji dayîk bûn û navê Luqman rakirin. Ev jî bersiveke ji dijmin re ye ku şehîd namirin. Luqman şehîd bû, lê çar Luqman hatin dinyayê.



# Piştgiriya Psîkolojîk

**Desteya jinê ya bajarê Qamişlo sala 2015'an, bi armanca piştgiriyê, ji kesên nexweşiya derûnî bi wan re çêbûyî, li Qamişlo Navenda Şehîd Amara velor. Derheqê kar û xabata navendê de Xelat Ismaîl ji rojname ya me re axivî.**



Rêvebera Navenda Şehîd Amara ya bajarê Qamişlo Xelat Ismaîl, derbarê kar û xebata navendê û armanca vekirina wê de wiha axivî: "Me li gelek bajaran navendên piştgiriya derûnî vekirine, wek Hesekê, Til Temir, Rimêlan û li Serê Kaniyê jî hebû. Lê piştî dagîrkeriya tirkî li ser bajar, navend hat girtin. Armanca me ji vekirina navendê ew bû ku alîkariya psîkolojîk bi civaka xwe re bikin. Bi taybetî piştî aloziya li Sûriye, herwiha êrişên dewleta tirkî ya dagîrker yên ser herêmên bakur û rojhilatê Sûriye, rewş zehemet bûye û gelek mirov hewceyî alîkariya derûnî ne. Wek hereketa jinê me pêwîstî bi navendeke wisa dît, da ku em piştgiriya civaka xwe bikin."

Xelat da zanîn ku kesên tên gel wan rewşên wan cuda ne û axaftina xwe wiha domand: "Em her kesî qebûl dikin; jin, zarok, zilam ji piçûk heta mezin, kî serî li navenda me dide em pêşwazî dikin û ji wan re dibin alîkar. Kesên ku tên, despêkê em rewşa wan nas dikin. Li gorî rewşa wan nîqaşê dikin û celseyên psîkolojîk ji wan re çêdikin. Piştî çend celseyan eger baş nebe em dişînin gel doktorekî psîkolojîk. Êdî doktor bi dermanan pirsgirêka wan çareser dike. Lê em rewşa wan dişopînin heta ku baş dibe."

Xelat da xuyakirin ku ji bilî rewşên li navendê, li gelek deveran semîneran didin û wiha dirêjî da axaftina xwe: "Em semîner û perwerdyên psîkolojîk jî li her deverê didin. Em carna li ser radyo û telvizyonê jî nîqaşa hin mijarên wek xwekuştinê jî dikin. Em bi pêngavên tedawiya psîkolojiyê jî radibin. Ji bo ku em karibin rê li ber rewşên xwekuştinê bigrin û civaka xwe biparêzin."

Rêvebera Navenda Şehîd Amara ya bajarê Qamişlo Xelat Ismaîl, di dawiya axaftina xwe de bang li malbatên nexweşan kir ku her malbat bi nexweşê xwe re alîkar be û got, bandora malbatê jî li ser kesê nexweş pir heye. Divê malbat li gorî rewşa danûstandinê bi wan re bikin û ji wan re nebin asteng. Da ku rewşa wan zehmettir nebe.

## Li Sûrî çi diqewime?



**Farûk SAKIK**

Di van rojan de li Sûrî gelek geşedanên siyasî pêk hatin.
Di 13ê Îlonê de serokê Sûrî Beşar Esad, li Moskova bi Vladîmîr Putîn re hevdîtinek pêk anî.
Rêveberiya xweser ya bakur rojhilatê Sûrî bi heyetên Amerikan re hevdîtin kirin.
Li gorî hin agahiyan ji Reveberiya Xweser hin kes derbasî Rûsya bûne.
Civîneke istixbarata Sûrî û Şamê jî li Baxdayê pêk hat. Ti kes nizane ka çi biryar hatine girtin.
Tevgerek jî li herêma Dera çêbû.
Di navbera artêşa Sûrî, milisên Îranê û mûxalifan de şer derket. Ji 2018'an ve cara yekê ye ku li wê derê ewqas tansiyon bilind bû. Lê bi navbeynkariya Rûsya agirbest hat ragihandin.
Em ji hevdîtina Pûtîn û Beşar dest pê bikin: Piştî şerê Sûrî ev cara sisiyan e ku Beşar Esad diçe Moskova. Di hevdîtinan de, herêmên di binê kontrola mûxalifan de ne wê çawa bikevin binê kontrola artêşa Sûrî hat axaftin. Behsa Idlib, Efrîn û Cerablûsê kirin. Serê Kaniyê û Grê Sipî hat jibîrkirin. Pûtîn digot, pirsgirêka herî mezin hebûna hêzên biyanî ye. Behsa Tirkiyê û Amerikayê dikir.
Piştî şer dest pê kir ji bo Beşar Esad, ji Rûsyayê alîkariya herî mezin di sala 2015'an de hat. Ji wê demê ve artêşa Sûrî gelek herêmên di destê mûxalifan de paş ve girtin.
Beşar Esad bi vê alîkariya Rûsyayê desthilatiya xwe jî mîsoger kir.
Yek ji sedemên ku Rûsya di sala 2015'an de li hewara wan ve hat jî, kontrolkirina Idlib û Efrînê bû.
Di pêvajoya şer de, hemû mûxalif li Idlibê kom kirin. Li ser Idlibê di sala 2020'an de agirbestek hat îlankirin û ji wê demê ve ye, ne Rûsya ne jî Rejimê êrişî vê derê nekir.
Lê hin niyet û hesabên Tirkiyê jî li ser Idlibê hebûn. Turkiyê ti carî têkiliyên xwe ji mûxalifan qût nekirin. Dixwest di roja çareseriya şerê Sûrî de wek qozekê bi kar bîne.
Di van demên dawî de jî, Tirkiyê ji Rûsya xwest ku bi hev re operasyonekê li dijî HTŞ'ê li dar bixin lê Rûsya ev yek qebûl nekir.
Hevdîtina 13'ê Îlona 2021'ê û daxuyaniyên piştî hevdîtinê, didin xwuyakirin ku Rûsya û Şam, bi israr in herêmê ji mûxalifan û hêzên çektar yên biyanî paqij bikin. Her du dewlet wê bi serê xwe ev yek bikirana.
Dewleta Tirkan ev niyeta wan dît û ji her alî ve hewl dide daxilî pêvajoya Sûrî ya îro bibe.
Her çiqas istixbaratên Şam û Enqerê hatibin cem hev jî, wê Şam bê Rûsyayê ti carî bi Turkiyê re nekeve nava danûsandinan.
Rûsya ji 2017'an ve dizane herêmên dewleta Tirkan dagîr kirine, eskerên xwe bi cî kirine û naxwaze ji wê derê derkeve. Rûsya hewl dide ku destûrê nede Turkiye hin deverên din dagîr bike û tavilê ji heremên dagîrkirî derkeve.
Ne Tirkiye tenê di heman demê de Îran jî hatiye ekartekirin. Îranê dema ku ev yek dît xwest hêz û statûya xwe ya Sûrî li hemberî Rûsyayê biparêze. Rejima Şamê, ji her du aliyan, Rûsya tercîh kir.
Wisa ku dema operasyonên fûzeyan yên Îsraîlê dest pê dikirin, Sûriye radarên xwe yên parastinê digirtin.
Em vegerin ser rewşa Kurdan; Kurd van hemû liv û tevgeran, ji nêz ve dişopînin û roj bi roj dîplomasiya xwe xurttir dikin.
Li bakûr û rojhilatê Sûrî hebûna Amerîka rastiyek e û Rêveberiya Xweser jî li gorî wê tev digere.
Tirkiye dema ji Rûsya ti germahî nedîtin, vegeriya endambûna xwe ya NATO'yê û anî bîra Amerikayê.
Heta îro jî ji aliyê Amerika ve ti lembeyên kesk ji Tirkiyê re nehatine pêxistin.
Dewleta Tirkan ya dagîrker vê carê ket davikan. Dîplomasiya Kurdan ew xist nava tengezariyek wisa êdî nikare tev bigere.



# Desthilatdariya PDK'ê....

# Li hundir celadê gelê xwe ye, li derve jî xulam e

Ji 23yê Nîsanê ve dewleta tirkî ya dagirker bi armanca dagirkirina başurê Kurdistanê êrişê Herêmên Parastinê ya Medya dike. Herwiha PDK'ê jî şuna ku li dijî van êrişan xwedî helwest be, bi şêveyekî fermî heya roja me ya îro jî van êrişa rewa dike û ew jî bi artêşa tirk re êrişê cihên gerîla dike.

**Navenda Nûçeyan/Şehba**

Ji 23yê Nîsanê ve dewleta tirkî ya dagirker bi armanca dagirkirina başurê Kurdistanê êrişê Herêmên Parastinê ya Medya dike. Herwiha PDK'ê jî şuna ku li dijî van êrişan xwedî helwest be, bi şêveyekî fermî heya roja me ya îro jî van êrişa rewa dike û ew jî bi artêşa tirk re êrişê cihên gerîla dike.

Di vê derbarê de jinên Efrînê kiryarên PDK'ê şermezar kirin û helwesta xwe li dijî siyaseta PDK'ê bi rojnameya Ronahî re parve kirin.

**'PDK'ê xwe avêtiye hembêza dijmin'**

Gulê Mihemed got: "Divê tişta ku îro rû dide girêdayî dîrokê bê şîrovekirin. Di demekê de ku têkoşîna hebûna Kurdan gihaye lûtkeyê ku tenê bi hewceyî yekrêziyê ye, mixabin aliyek xwe davêje hembêze dijmin û li gorî berjewendiyên wî tevdigere! Pêwîste dersên ixanetê ku di dirêjahiya dîrokê de derketine di ber çavan re bên derbaskirin".

Gulê Mihemed bang li hêzên siyasî kir ku berê xwe bidin itîfaqê, herwiha ji PDK'ê xwest ku dev ji xeta dijminê kurdan berde û gotinên xwe wiha bi dawî kir: "Pêwîste PDK'ê bi lez dev ji xeta sîxurtiyê berde.



Dewleta dagirker a Tirk derfetê jiyanê na de wa jî. ji ber ku kesê îxanetê li gelê xwe bike baweriya dijmin jî pê nayê. Li şûna ku vî karî dike, bila têkoşîna tekûzkirina statuya Kurd bilind bike û ji têkoşînên li beşên dîtir ên Kurdistanê re bibe pal û pişt".

**PDK'e nûnerê xeta xwefiroş e**

Endama Meclîsa Jin a PYD'ê ya li Şehba Hêvîn Silêman jî got, demek dirêje dagirkeriya Tirk êrişeke dijwar bi ser Herêmên Parastina Medyayê ve pêk tîne. Desthilatdariya PDK'ê jî bi hemû siyasetên xwe di nav van êrişan de cih digire. Bi dayîna derfetên êrişan û bi bêdengiya li herêmê, kuştina sivîlan, gelek eşkere ye ku **PDK'ê temsîla xeta xwefiroş dike.**



Hêvîn siyaseta PDK'ê û AKP'ê rûbirûyî hev dike û dibêje: "Hukumeta AKP'ê ya faşist li Bakurê Kurdistanê mirovan qetil dike, davêje zindanan û derfetê nade bizavên demokratîk, desthilatdariya PDK'ê jî li Başûrê Kurdistanê kopyakî wê ye. Siyaset û nêzîkatiyên PDK'ê ji Şoreşa Rojava re heman nêzîkatiyên dagîrkeriya Tirkiyê ye. Eger îro jî tevgera Kurdî parçe be û hemû hewldanên yekîtiyê badilhewa diçin, sedema sereke astengiyên siyaseta PDK'ê yên girêdayî berjewendiyên dagirkerên Kurdistanê ye."

Endama Meclîsa Jin a PYD'ê li taxa Şêx Meqsûd Hêvîn Silêman di dawiyê de helwesta PDK'ê li hemberî êrişên dagirkirina Efrînê, koçberkirina şêniyên wê û kiryarên guherîna demografîk nirxandin û got: "Çawa ku PDK'ê li hemberî êrişan li ser Efrinê bê deng ma, îroj jî li hemberî hewldanên qirkirinê û siyasetên guherîna demografîk li Efrînê û hemû herêmên hatine dagirkirin bê deng maye. Herwiha kujerên Kurdan li Hewlêrê pêşwazî dike. Ji vê mezintir û beloqtir îxanet nîne."



**'PDK'ê dagirkeriyan rewa dike'**

Hevseroka Meclîsa Giştî ya taxên Şêx Meqsûd û Eşrefiyê li Helebê Valantîna Ebdo jî ji rojnameya me re axivî û nerîna xwe wiha anî ziman: "Çawa ku neyarên Kurdan dijminatiya Kurdan weke erk ji xwe re dibînin, PDK'ê jî sîxurtiya xwe weke erk dibîne! Di wextekî de her kes li benda helwesta PDK'ê bû ku li hemberî êrişên dagirkeriyê bêdeng nemîne, mixabin li dijî hêzên gerîla ku statuya Başûrê Kurdistanê diparêzin, dest dide dijmin û êrişî gerîlayan dike".

Valantîna Ebdo bi bîr xist ku desthilatdariya PDK'ê û şaxê wê yê li Rojavayê Kurdistanê (ENKS'ê) hewl didin dagirkeriya Tirkiyê li Efrîn, Serê Kaniyê û Girê Spî rewa bikin û gel teşwîqî vegera bin siya dagirkeran dikin û wiha domand: "Ji bona ku dagirkerî meşrû bibe, PDK'ê li her parçeyek welêt şaxek xwe ava kiriye. Li Rojava jî ENKS'ê bi talîmata PDK'ê û MÎT'a Tirk tev digere. Bangên vê dawiyê ku gel radestî çeteyan bikin, hewldanên têkbirina vîna berxwedanê ne."

Valantîna Ebdo wiha dawî li gotinên xwe anî: "Kiryarên PDK'ê carek din eşkere dike ku desthilatdariya wê li kuderê dibe bila bibe û çi navî li xwe dike bila bike, bi xeta îxanetê re bûye yek parçe".

Hêjayî gotinê ye, li gorî nûçeyeke RojNews, tevî hemû bang û hişyariyan, çekdarên PDK'ê hemwextî êrişên dewleta Tirk a dagirker ên li ser Herêmên Parastina Medyayê, di nava salek û nîv de 22 caran hêz şandine herêmên gerîla; êriş an jî hewldana êrişê kirine. Ji ber van pêkanînên PDK'ê heta roja îro jî 19 gerîla şehîd bûne.

# Kuştina jinê kuştina jiyanê ye

**Darîn Silê/Qamişlo**

**Eyşa Mehmûd: Divê cezayê herî giran li sûcdarên kuştina jinan were birîn, da ji cîhanê re bibin mînak.**

Ev çend sal in herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê di rewşeke şer de ne. Li Sûriyê rewşeke wisa heye ku tevayiya aloziyên dinyayê tê de kom bûne. Bi taybetî dema dawî dewleta tirkî ya dagîrker êrişên xwe yên ser herêmê zêde kirine. Ne êriş tenê, tevlîhevî û sûcên li hemberî jinê jî zêde bûne. Dijmin dixwaze di her aliyê jiyanê de Kurdan bide kuştin û wan bifetisîne. Bi taybetî di her êrişê de despêkê berê xwe dide jinê. Herwiha bi kuştin û revandina jinan ya bi destê çeteyan dixwaze civakê bişkîne û tirsê bixe nava gel.

Endama Koordînasyona Kongreya Star ya bakur û rojhilatê Sûriyê Eyşa Mehmûd derbarê kuştina jinan de wiha axivî: "Dema dawî li herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê kuştina jinan pir zêde bûye. Ev jî girêdayî şerê taybet yê dijmin e. Bi şerê taybet destdirêjiya xwe li ser jinê dikin. Ji ber ku şoreşa niha em pê bang dikin, bi pêşengiya jinê hatiye lidarxistin, dijmin her tim berê xwe dide jinê. Dixwaze bi riya jinan şoreşê û destkeftiyên wê bêwate bike. Herwiha dixwaze zihniyeta DAIŞê ya ku jinan li hemberî wê şer kiriye û têk biriye vegerîne. Ji ber wê bi riya kuştin û destdirêjiya li ser jinan, tevlîheviyê di nava civakê de derdixe û bi vê dixwaze îradeya jinan lewaz bike û edî jin di vê şoreşê de xwe kêm bibîne. Lê rêxistina me jinan heye, dewleta tirkî û dijminên Kurdan yên din çiqas tevlîheviyê derxin jî ti bandorê li me nakin. Çimkî emê li ser restiya demokrasî û azadiyê bijîn. Ji bo wê em ti carî bin nakevin."


Eyşa Mehmûd got, heta niha zihniyeta desthilatdar di nava civakê de heye û axaftina xwe wiha domand: "Di nava civakê de lîstok hene. Em dibînin dema ku jin tê kuştin, bi namûsê ve girê didin. Herwiha dema ku pirsgirêkên derexlaqî jî hebin, her tim hesab ji jinê tê xwestin. Gelek caran jin bi vî rengî tên kuştin. Eger jin sûcdar be jî ne sûcdar be jî tê kuştin. Lê ti caran di nava civakê de hesap ji zilam nayê xwastin. Ev zihniyeta desthilatdar ya mêr e. Emê jî li hermeberî vê zihniyetê têkoşîna xwe xurttir bikin."

Divê ji sûcdaran hesabê giran were xwestin

Eyşa Mehmûd behsa cezayê sûcdarên kuştina jinê kir û wiha got: "Dema ku jinek tê kuştin despêkê em lêkolîn dikin ka sedema kiştina wê çi ye. Wek tevgera jinan çi ji me tê xwestin em dikin û bi jinan re dibin alîkar. Piştî ku sedemê nas dikin êdî Meclisa Edaletê cezayê kesê sûcdar diyar dike. Divê cezayê herî giran li kesên sûcdar were birîn. Herwiha ji cîhanê re were xuyakirin ku tevgereke jinê li vir heye, piştgiriya jinan dike heta ku jin bigihin azadî û mafê xwe. Niha cezayê herî giran yan zindana mûebed yan jî salên demdirêj e. Lê divê em di aliyê perwerdekirinê jî mejiyê van sûcdaran biguherînin ne tenê ceza li wan bibirin. Di nava civakê de jî em guhertineke zihnî bidin çêkirin. Herwiha em meş, civîn û semînerên li ser kuştina jinê li dar bixin, da ku em rê li pêşiya kiştina jinê bigrin."

`Jin pêşeng û bingehê civakê ye`

Endama Koordînasyona Kongreya Star ya bakur û rojhilatê Sûriyê Eyşa Mehmûd, helwesta xwe li hemberî sûcên kuştina jinê diyar kir û axaftina xwe wiha qedand: "Wek Kongereya Star em kuştin û şideta li ser jinê şermezar dikin. Em dibêjin jin pêşnga civakê ye. Bingehê ku civak li ser ava dibe jî jin e. Yê ku jinê dikuje jiyanê dikûje. Ji bo wê banga me ji tevayiya jinên cîhanê re heye ku derkevin qadan û bi yek dengî bang bikin ku jin ne namûsa ti kesî ye. Çimkî em hatine ku li dinyayê bijîn ne ku bêmaf bimînin û werin kuştin. Divê jin bibe xwediya jiyaneke rast û xwedîmaf."



# 'Komploya 15ê Sibatê, bi tecrîd û êrişên qirkirinê didome'

Têkildarî tecrîda girankirî ya li ser rêber Ocalan û girêdana wê ya bi êrişên dewleta tirkî ya dagîrker ve yên ser başûrê Kurdistanê, endamê Desteya Rêveber ya PYDê Ehmed Şêxo bi rojnameya me re axivî.

Serbest EHMED/Qamişlo

### "ARMANCA WAN TINEKIRINA TEVGERA AZADIYÊ BÛ, LÊ BI SER NEKETIN"

Şêxo bîr xist ku armanca komploya 15'ê Sibata 1999'an pêşîgirtina li têkoşina azadiya gelê Kurd bû. Herwiha teqez kir ku tecrîda girankiri ya li ser Rêber Apo û êrişên dewleta tirkî yên qirkirina Kurdan berdewamiya komploya 15'ê Sibatê (Komploya Navnetewî) ye û wiha dirêjî da axaftina xwe: "Encama komployê tersî planên hêzên hegemon derket; nikarîbûn rê li pêşiya fikrê Rêber Apo bigirin û têkoşîna azadiya gelên bindest xurttir bû. Dewletên dagîrker ev ji bo planên xwe yên li ser gelan wek metirsiyeke mezin dîtin. Ji ber wê dewleta tirkî ya dagîrker, di şexsê rêber Ocalan de pêvajoya her cure êrişên qirkirinê yên li ser gelê Kurd dan destpêkirin."

Şêxo herwiha diyar kir ku projeyên sîstema kapîtalîst û dewleta tirkî ya dagîrker yên li dijî civakên Rojhilata Navî heta roja îro didomin û ev nirxandin kir: "Rêjima Tirkiyê her bi xewn û xeyalên ku dewleta Osmanî ji nû ve ava bike dijî. Jixwe ev proje bi alîkariya hêzên hegemonîk tê plankirin. Ji bo wê, planên qirêj bi tinekirin û bişaftina civakan, herwiha xurtkirina nijadperstiyê li ser esasê YEK AL, YEK DEWLET û YEK ZIMANî pêk tîne."

### "NETEWEYA DEMOKRATÎK CIVAKAN AZAD DIKE Û PROJEYÊN KAPÎTALÎSTA DIXETIMÎNE"

Ehmed Şêxo herwiha teqez kir ku yê projeyên kapîtalîst û planên Erdogan asteng dike û dixetimîne, sîstema NETEWEYA DEMOKRATîK e. Ji ber wê dewletên hegemon dixwazin bi çavsoriya dewleta Tirkiyê ku berdêl çi be jî, têkoşina azadiya kurdî lewaz bikin. Lewra ji aliyê gelên bindest ve, pejirandina sîstema NETEWEYA DEMOKRATÎK û belavbûna wê, ji bo sîstema desthiladar ya kapitalîst metirsiyekê herî mezin e."

### "ÊRIŞ, TECRÎD Û POLIÎTÎKAYÊN LI DIJÎ GELAN, JI KOMPLOYA NAVNETEWYÎ NE QUT IN"

Endamê Desteya Rêveber ya PYDê bal kişand ser polîtîkayên qirêj yên dewleta tirkî û wiha berdewami da axaftina xwe: " Projeyên qirêj yên dewleta tirkî û alîgirên wê bi mayîndebûna sîstema NETEWEYA DEMOKRATÎK wê hilweşin. Ji ber wê li Îmralî tecrîda li ser Rêber Apo her ku diçe girantir dikin. Herwiha ji 23yê Nîsanê ve NATO şerekî bi riya artêşa tirkî dimeşîne û bi çekên kîmyayî qadên gerîla topbaran dike. Di heman demê de dewleta dagîrker



ya Tirkiyê, dîsa bi erêkirina dewletên hegemon êrişî deskeftiyên gelên li bakurrojhilatê Sûriyê dike. Ev kiryar bi giştî ji komploya 15'ê Sibata 1999'an ya di şexsê Rêber Apo de li hemberî gelê Kurd hatî kirin ne qut in."

Endamê Desteya Rêveber ya PYDê Ehmed Şêxo bi van gotinan axaftina xwe qedand: "Em dizanin polîtîkaya niha ya li ser gelê Kurd tê meşandin berdewamiya komploya navneteweyî ya beriya 22 salan e û armanca wê jî zeîfkirina têkoşina azadiyê û deskeftiyên Kurdan ji holê rakirin e. Lê rojbiroj bi fikir û felsefeya Rêber Apo û bi hevgertina gelên bindest têkoşîna li dijî faşîzm û dagîrkeriyê xurttir dibe û ev têkoşîn wê dawiya faşîzmê û desthilatdariyê bîne."

# Şêx Baqî: Çima ENKS banga vegerê li koçberên li kampa Domiz nake?

**Cemal Şêx Baqî got, doza şêniyên Efrînê ne vegera li warên xwe ye, doza welatekî dagîrkirî ye û ENKS dixwaze ji bo piştgiriya dewleta tirkî vê dozê ji holê rake**

Li ser idîayên ENKS'ê ku Efrîna dagîrkirî herêmeke ewle ye Cemal Şêx Baqî ev nirxandin kir: "Wê kî ji van idîayên ENKS'ê -ku li kêleka serçeteyan û kujerên têkoşer Hevrîn Xelef in, yên mîna Hatim Ebû Şeqra û Ebû Emşe disekinin- bawer bike? Divê ENKS li hemberî gelê xwe rêzdar be û ji xwe şerm bike. Ew nikare gelê Kurd bi van derewan bixapîne."

Şêx Baqî got, eger ENKS bi rastî xeta neteweyî ya Kurdî dişopîne çima di êrişên destpêkê yên çeteyan yên li Serê Kaniyê yên 2012'an de reviya, ma gelo ev xeta neteweyî ye?"

'ENKS dagîrkirinê rewa dike'

Li ser bangên ENKSê jî Şêx Baqî wiha axivî: "ENKS bi hemleyên xwe yên propaganda yên ji bo vegera şêniyên Efrînê li warên xwe, dixwaze doza dagîrkirina Efrînê ji holê rake û dagîrkirinê rewa bike. Herwiha bi wê re doza koçberan biqedîne. Eger tişta ku ENKS dibêje rast be û xwe wek saziyeke sivîl û hevalbenda Tirkiyê dihesibîne bila destpêkê malbatên xwe vegerînin. Wek em dizanin hin endamên ENKS'ê ji şêniyên Efrînê ne, wê demê emê bibînin ka wê çi bi serê wan û malbatên wan were."

'Çima bang li koçberên li kampa Domiz nake ku vegerin warên xwe?'

Cemal Şêx Baqî diyar kir ku şêniyên Efrînê yên li Şehba li ser xaka xwe ya Sûriyê ne û ji welatê xwe bi dûr neketine û got, gelo wê ji koçberên li derveyî xaka Sûriyê re çi were gotin. Mîna koçberên li kampa Domiz. Çima ENKS bang li wan nake ku vegerin warên xwe? Ji vê jî eşkere dibe ku dixwazin kampa Şehba vala bikin ku mijara dagîrkirinê bidin jibîrkirin."

Kampa Domiz li herêma Dihokê ya li başûrê Kurdistanê ye ku di binê serweriya PDK'ê de ye.

Şêx Baqî herî dawî wiha got: "Mentiqê ku ENKS'ê dewama rêzeplanên Tirkiyê yên li dijî Kurdan e. Eger ENKS bi rastî dixwaze koçber li warê xwe vegerin, divê li dijî dagîrkeriyê serî hilde û eger nikare vê bike, divê bang li hêzên cîhanê bike ku herêmeke ewle di binê çavdêriya NY de were avakirin. Lewra eger ewleyî li herêmê pêk neyê wê çawa welatî vegerin warên xwe?"

***Çavkanî-ANHA***



## Ji nêz ve

### Rûsya çima MSD vexwend Kremlînê?

Ednan Mustafa

Di 23yê Cotmeha sala 2019an de, di navbera dagîrkeriya Tirkan û Rûsya de peymana agirbestê hat imzekirin. Armanc ji vê peymanê ew bû ku dagîrkeriya Tirkan êrîşên xwe yên li ser bakur û rojhilatê Sûrî bide sekinadin. Lê digel agirbesta heyî û peymana 23ê Cotmehê, dagîrkeriya Tirkan bê ku zagonên navneteweyî, urfên mirovayiyê û peymanê nas bike, her roj êrîşên xwe li ser gund û bajarokên bakur û rojhilatê Sûrî didomîne. Gelo armanca Faşîzma AKP'ê ji êrîşên dawî li ser Şehaba, Minbic, Til Temir û Zigran çi ye? Herwiha bê erêkirina Rûsya dagîrkeriya Tirkan dikarê êrîşên xwe berdewam bike? Di demekê de ku êriş pêk tên armanca Rûsya çi ye ku şandeyeke ji MSD'ê bi serokatiyê İlham Ehmed vexwendiye Moskovayê?

Dagîrkeriya Tirkiyê di meha Tebaxa borî de, êrîşên xwe yên hovane li ser sivîl û cih û warên bakur û rojhilatê Sûrî berdewam kirin. Bê ku zagonên navneteweyî nas bike û hesabê ji ti hêzan re bike, sûcên şer pêk anîn. Li hemberî van sûcên şer yên dagîrkeriya Tirkiyê dike, di serî de Rûsya, gelek hêzên navneteweyî çavên xwe ji sûcên Tirkiyê re digrin.

Piştî heft salan ji mûdexeleya Rûsya ya Sûrî, li cihê ku Rûsya riya çareseriyê ji bo pirsgirêka Sûrî xêz bike, berûvajî vê yekê Rûsya bû beşek ji pirsgirêka Sûrî. Sedema sereke ew e ku Rûsya her daîm riyên çareseriya krîza Sûrî li derve geriya û bi riya têkiliyên xwe bi Tirkiyê re xwest pirsgirêka Sûrî çarser bike. Weke çawa bi dizê malê dixweze malê biparêze. Rûsya jî bi Tirkiya ku bûye sedema aloziya Sûrî û bi rêjima ku bûye piştgir ji komên çete û tundrew re dixwest aramiyê li seranserî Sûrî bide avakirin. Di heman çarçoveyê de, li cihê ku Rûsya weke hêzeke garantor ya çaseriyê xwe bide nîşandan, çavê xwe ji sûc û êrîşên dagîrkeriya tirkî re digire. Li aliyê din Hêzên Sûriya Demokratîk-HSDê bi 'zêdegaviyên' li dijî Tirkiyê sûcdar dike. Ango bi awayekî eşkere Rûsya daxweziya sekinadina çalakiyên rewa yên li dijî êrîşên dagîrkeya tirkî dike û bê ku fedî bike dibêje çalakiyan rawestînin. Ev daxwaziya sosret ya Rûsya ji hêzên HSD'ê, di demekê de dibe ku Kurd li ber qirkirinê ne. Ji ber wê zehemt e ku ev siyaseta Rûsya were femkirin û qebulkirin. Xeta parastina rewa ya ku HSD dide meşandin, ti carî ne di pozisyona êrîşan de ye. Her gava ku êrîş çêbûne, HSD'ê bersiva wan êrîşan daye. Ji ber vê yekê li cihê ku rayedar û fermandarên Rûs daxweziyeke wiha ji HSD'ê bikin, bila daxwaziya vekişîna dagîrkeriyê ji erdnîgariya tewanên dij mirovayiyê bi destê çeteyan û Tirkiyê tê kirin bike.

Di rewşeke wiha de ku zexteke wiha tê kirin, vexwendina Şandeya MSD'ê ji bo Moskova cihê matmayînê ye. Meqseda Rûsya bi pêngaveke wiha çi ye? Wisa diyar e li pêşberî Rûsya krîzeke mezin heye bi Tirkiyê re. Rûsya ji bo dagîrkeriya tirkî bîne ber lingê xwe, careke din li ser pişta Kurdan siyasetê dike. Ji aliyekî ve zexteke piratîk li ser HSD'ê dike û ji aliyê din ve MSD'ê vedixwîne hevdîtinan. Armanca Rûsya diyar e; Rûs bi vê siyasetê dixwezin tewîzên zêde ji Tirkiye bigirin û berî gavekê dosya HTŞê ya li İdilbê çareser bikin. Di heman demê de, Tirkiyê careke din bikişîne zemînê civîna Astana û bi riya van civînan bajarê Derha Beled careke din vala bike.

Di heman mijarê de, ji bo Rêveberiya Xweser, hewayeke erênî bide avakirin ku va ye, em li rex we ne û piştgiriya we dikin. Di çarçoveya polîtîkaya Rûsya ya berê de jî, ku Rêveberiya Xweser ev demeke li ser kar dike. Careke din rewşeke aram bide avakirin ku hevdîtin di navbera Rêveberiya Şamê û Rêveberiya Xweser de werin destpêkirin.

Rûsya bi siyaseta xwe ya dualî, hem sûdê ji hêza Rêveberiya Xweser digire û dagîrkeriya tirkî tengav dike û hem jî dixweze bi riya faşîzma tirkî bakur û rojhilatê sûrî çokê dayne. Lê rastiya Sûrî û bakur û Rojhilatê Sûrî îro jiyan dike û asta ku Rêveberiya Xweser gihîştiyê ne pêkan e ku bi polîtkeyeke wiha erzan were xapandin.



# PDK Û ENKS WÊ PIŞTÎ XIYANETÊ ÇI BIKIN?

Çalakvanên jin: PDK bi hewlest û hevakriya bi dewleta tirkî ya dagîrker re, xiyanetê li gelê xwe dike. Banga ENKS'ê jî rewakirina dagîrkeriyê ye û ji aliyê MÎTa tirkî ve ev bang hatiye plankirin.

NAVENDA NÛÇEYAN /QAMIŞLO

### PDK'ê herêm pêşkêşî Tirkan kiriye

Siyast û projeyên qirkirinê yên li ser gelê Kurd û destkeftiyên wî, ji aliyê dewleta tirkî ya dagîrker ve rojbiroj qirêjtir dibin. Di van êrişan de jî PDK ya qaşo xwe wek partiyeke kurdî dide xuyakirin, rola xiyanetkar û hevakara êrişkaran dilîze. Herwiha bi liv û tevgera xwe teqez dike ku di rêza dijminê Kurdan de ye. PDK û hêzên pê ve girêdayî (ENKS) li rojavayê Kurdistanê bi dijminê Kurdan re kar dikin. PDK bi çemberkirin û dorpêçkirina qadên gerîla hem rola hevkar û xiyanetkar bi rengekî leşkerî û istixbaratî nîşan dide, hem bi daxuyaniyên xwe dixwaze dagîrkeriyê rewa bike.

Têkildarî êrişan, xiyaneta PDK'ê û hevkariya ENKS'ê bi dijminê Kurdan re Endama Meclisa Rêxistina Jina Azad ya Kurdistanê (RAJK) Jîno Reşîd û Koordînasyona




Kongereya Star ya Kantona Efrînê Fatima Silêman ji rojnameya me re axivîn.

Jîno Reşid bîr xist ku dîroka polîtîka û projeyên qirkirina gelan ya dewleta tirkî ya dagîrker dîrokeke kevnar e û wiha got: "Şoreşa rizgariya gelê Kurd ya bi fikrê Rêber Apo dayî destpêkirin jî, hebûna rêjima tirkî ya faşîst xist xeterê. Ji ber wê bi rengekî hovane li her alî, êrişên qirkirinê didomîne û bi van êrişan dixwaze gelê Kurd û têkoşîna wî tine bike."

Endama Meclisa RJAK'ê Jîno Reşid herwiha rola PDK'ê ya di van polîtîkayên dijminê Kurdan de wiha anî ziman: "Dewleta tirkî dixwaze herêmên dagîr kirîn firehtir bike. PDK jî ji bo berjewendiyên xwe, xaka di binê desthilatdariya xwe de pêşkêşî dewleta dagîrker dike. Artêşa dagîrker jî herêm, ji xwe re kiriye barageh. Li hemberî van êrişan hem li Herêmên Parastinê yên Medya, bi pêşengiya şervanên YJA Star, hem li rojavayê Kurdistanê bi pêşengiya şervanên azadiyê YPJ berxwedaneke pîroz tê kirin. Jixwe bi vîna jina azad û berxwedêr ya DAIŞ bin xistî, wê êrişên heyîn jî bên şkandin."

### ENKS di êrişan de berdevka siyasî ya DAIŞ'ê û El Nusra bû

Herwiha Endama Koordînasyona Kongereya Star ya Kantona Efrînê



Fatima Silêman derbarê heman mijarê de ev nixandin kir: "Dewleta tirkî ya dagîrker û çeteyên wê li bakur û rojhilatê Sûriyê planên qirkirinê didomîn. Lê li hemberî van planan, gelê me pêlên berxwedanê -ku bingehê wê fikrê Rêber Apo ye- rojbiroj xurttir dike. Di vê berxwedanê de gel ji bo vê xakê bi dehhezaran şehîd dan û bi saya wan şehîdan destkeftiyên mezin bidest xistin. Ji ber wê dijmin bi tank, top û balafirên xwe êrişî Efrînê kir û xwest vê îradeyê û van destkeftiyan ji holê rake. Lê gelê me bi vîn û baweriyeke mezin li Şehba bi cî bû û têkoşîna xwe didomîne. Herwiha pişgiryê dide hêzên xwe yên rizgariya Efrînê."

Fatima herwiha da zanîn ku ji destpêka şoreşa Rojava ve ENKS'ê bi rengekî eşkere dijberiya xwe nîşan da û li dijî gelê Kurd tev geriya. ENKSê di êrişên çeteyên Cebhet El Nusra û DAIŞê yên ser Efrînê, Serê Kaniyê û Girê Spî de xwe dikir berdevka van çeteyan û dixwest êrişan rewa bike."

### Bang bi zimanê ENKS'ê ye, lê plan ya MÎT'a tirkî ye.

Fatima li ser banga ENKS'ê ya vegerê ya li xelkê Efrînê kirî, ev nirxandin kir: "Dewleta tirkî ya dagîrker tevî sûcên qirêj, qirkirin û guhertina demografîk, li rex şerê taybet bi her şêwazê êrişên xwe li ser herêmê û gel didomîne. Di vê dema dawî de ENKS'ê rûyê xwe zêdetir reş kir. Bang li xelkê Efrînê kir ku vegerin warê xwe û di binê zora dagîrker û çeteyên xwînmij de bijîn. Em dizanin ku Kampa Berxwedan weke kelemeke di çavê dijmin de ye. Ji ber wê bi riya xiyanetkarên Kurd şerê taybet dimeşîne. Dixwaze dagîkeriya xwe rewa bike û gelê vegeriyayî wek mertalekî zindî di êriş û kiriyarên xwe de bi kar bîne. Ji ber wê rê û sînoran vedike. Ji aliyê her kesî ve diyar e ku bi zimanê ENKSê ev bangxwazî tê kirin, lê bi planên MÎT'a tirkî ye."

Endama Koordînasyona Kongereya Star Fatima Silîman, bi vê bangê axaftina xwe qedand: "Em li dijî bangxwaziya xiyanetê, banga xwebirêxistin û xurtkirina têkoşînê li gelê xwe dikin. Herwiha em bang li tevayiya cîhanê, bi taybetî li jinan dikin ku çavên xwe li van êriş û sûcên dermirovî negirin û xwedîbertek bin. Divê gelê Kurd li her çar parçeyan bi yekîtiya xwe xiyanetkaran riswa bikin û wan di nava xwe de qebûl nekin."

# PKK: Dewleta tirkî û nokerên wê hevalê me Yasîn Bulut kuştin

**PKK'ê bi daxuyaniyekê diyar kir ku dewleta Tirk hevrêyê wan Yasîn Bûlût (Şukru Serhat) bi rengekî hovane qetil kiriye. PKK`ê bang li hemû partiyan û kesayatan kir ku helwesta xwe nîşan bidin.**

Komîteya Têkiliyên Derve ya PKK'ê bi sernavê "Daxuyaniya lezgîn ji bo raya giştî" daxuyaniyek weşand.

Daxuyanî wiha ye:





"Rêxistina kontra ya dewleta Tirk a faşîst MÎT û kontrayên noker ên ser bi wan ve, du roj in li bajarê Silêmaniyeyê yê Başûrê Kurdistanê êrişî welatparêzên Kurd ên Bakurî û hevalên me dikin. Dewleta Tirk a kujer û nokerên wan îro (17.09.2021) serê sibehê hevalê me Yasîn Bûlût (Şukru Serhat) li Silêmaniyeyê ku ji bo tedawiyê lê bû, li ber mala ku lê dima bi rengekî hovane qetil kir. Hevalê me Yasîn Bûlût serê sibehê ji malê derket ji bo biçe nexweşxaneyê. Di vê kêliyê de kontrayekî Tirk ji pişt ve nêzî wî bû, lê da û ew şehîd xist. Ev kuştina bi hovane ne tenê êrişek li dijî me ye, êrişek li dijî tevahiya xelkê Başûr û aramiya Silêmaniyeyê ye.

'Rêzekuştin hate plankirin'

Rojek beriya vê kuştina hovane, heman hêzan li kargeha wî li welatparêzê Kurd Ferhat Bariş Kondû xistin ku Kondû penaberekî siyasî yê Bakurî ye. Rûdana van herdu bûyeran li pey hev, nîşan dide ku Erdogan ê faşîst û rêxistina wî MÎT'ê bi rengekî plankirî dest bi rêzekomkujî û kuştinên siyasî kiriye. MÎT a Tirk li vê derê ewçend bi hêsanî û serbest terora dewletê ya daîmî dike. Ji ber vê yekê jî di serî de hikumeta Başûr divê berpirsyarên herêma Silêmaniyeyê tavilê daxuyaniyeke lezgîn bidin û tedbîrên pêwîst hemûyan werbigirin. Ev êrişa hovane li dijî xelkê me yê Silêmaniyeyê ye, li dijî aramî û ewlehiya vî bajarî ye. Eger dewleta Tirk a faşîst dikare ku li her parçeyekî Kurdistanê komkujiyan bike, ev yek li me Kurdan ferz dike ku bi lezgînî helwesteke hevpar nîşan bidin û tedbîran werbigirin. Eger li hemberî van komkujiyan helwest neyê nîşandan, kujer tavilê neyên girtin û neyên teşhîrkirin wê komkujer hêzê ji vê yekê werbigirin.

Banga li gel û partiyan

Em Tevgera Azadiyê ji bo têkoşîna ku hevalê me ji bo gelê Kurd dayî, li keda 40 salan û hewldana wî bi xwedîderketina li bîranîna wî têkoşînê geş bikin û bersivê bidin. Hevalê me yê 64 salî bi salan ji bo têkoşîna azadiyê ya Kurdistanê bi ruh û can xebitiye û bi şoreşgerên wiha re ku di vê rêyê de şehîd bûne, xebitiye. Hevalê me Yasîn Bûlût (Şukru Serhat) ku li gel temenê wî zêde bû jî û nexweşiya xwe jî ev kedeke mezin daye, herî dawî dema ku nexweşiya wî lê giran kirî, ji bêgavî çûye Silêmanî, li wir xwestiye ku tedawî bibe. Lê dewleta Tirk a faşîst ji ber ku ji bo her Kurdî fermana kuştinê daye, li naverasta kuçeyê êrişê dibe ser mirovên nexweş û qetil dike. Gelê me bi rengekî ku layiqî têkoşîna hevalê me Yasîn Bûlût be divê li şehadeta wî xwedî derkeve. Di serî de gelê me yê welatparêz ê Başûr, em bang li hemû partiyan û kesayatan dikin ku helwesta xwe nîşan bidin, xwedî li şehîd Yasîn Bûlût derkevin û bibin xwedî helwest. Em tevger dev ji vê rûdanê naqerin û em ê li bîranîna hevrêyê xwe xwedî derkevin."



## FENER



### Bê vîna gelan çareserî ne pêkan e

Idrîs HENAN

Pêvajoya çareseriya aloziya li Sûriyê di gelek stasyonên navxweyî, herêmî û navdewletî re derbas bû. Bi asêmayîna şêwazên lihevkirina hundir re, insiyatîfa Yekîtiya Ereban ya 2yê Mijdara 2011'an qeyran ber bi herêmbûyînê ve bir. Jixwe pişt re reaksyonên dewletan yek bi yek aloziya li welêt ber bi navdewletbûyînê ve dibirin. Ji aliyê xwe ve tundiya helwesta Fransa û Qeterê, serdana wezîrê karê derve yê Tirkiyê Ehmed Dawûdoglo û hewldana dabeşkirina desthilatdariya li Sûriyê bi Ixwan Elmislimîn re, pişt re boykota Erebistana Siûdî û bangên dûrketina Esed ji desthilatdariyê yên serokê DYA Obama û serokwezîrê Ingilistanê Kamîron, hiştin ku hêdî hêdî qeyrana li welêt sînorên herêmî jî derbas bike. Bi vetoya 4ê Cotmeha 2011'an ya li Konseya Ewlekariyê re, helwesta Rûsyayê jî zelal bû. Tezên blokbûnên li ser axa Sûriyê xuya dikirin aliyên dijberên hev li Sûriyê ber bi tundbûn û xwebihêzkirinê ve diajotin. Rejima desthilatdar pala xwe da piştgiriya Îran û Rûsyayê, aliyên "rikber" jî difikirîn wê heman senaryoya Lîbya li Sûriyê jî pêkan be. Di wê navê de tevgera Ixwan Elmislimîn ku bi piştgiriya Tirkiyê li herêmê tev digerî bi desteka "Deklarasyona Şamê" û bi biryara "Meclisa Şêwrê" yê cema'etê re, tevgera li Sûriyê di Cotmeha 2011'an de bi çek kirin. Ango du eniyên piştgiriyê ava bûn. Rûsya, Îran û Hîzbûlah piştgiriya rejima Sûriyê kirin. DYA, Fransa, Tirkiyê û Qeter piştgiriya çekdaran dikirin.

Tevî vê bizava navdewletî û herêmî, aloziya Sûriyê hundirbûna xwe jî ji dest neda. Ji wir û pê ve û bi mûdexeleyên hêzên navneteweyî re "Deklarasyona Cenevre 1" a 30ê Hezîran 2012'an derket. Lê piştgiriya DYA ji çekdaran re û paşguhkirina îradeya gelên Sûriyê, ew daxuyanî bê bandor hişt.

Di vê pêvajoyê de, li ser erdê, gelek guherînên bikok çêdibin. Paralelî biryara DYA ya xistina çeteyên Cebhet El Nusra lîsteya terorê de, serokê Itîlafê yê wê demê Mû'az Elxetîb li Mexribê di kongerya "Dostên Sûriyê" yê 12.12.2012'an de parastina çeteyên El Nusra dikir û biryara DYA red dikir! Li gorî rojnameya NewYork Times weşana 27.4.2013'an, Obama piştî ku Itîlafa Ixwanan weke nûnerê gelê Sûriyê nas kiribû, têgihîşt ku serweriya islama radîkal tê wateya Sûriyeke radîkal û tundrew. Ji lewra wezîrê karê derve Jon Kêrî şand Mosko û itîfaqa 7ê Gulana 2013'an bi hemtayê xwe Lavrov re imze kir. Lihevkirin jî ew bû ku naveroka danezana Cenvra 1 pratîze bikin û Cenevre 2 li dar bixin.

Her kes pêvajoyê nas dike û hewce nîne em dirêj bikin. Tişta pêwîst e bê zanîn ew e ku; navdewletîkirina qeyrana Sûriyê û paşguhkirina hêz û mekanîzmeyên çareseriya hundir, bi xwe re Cenevre 2 û 3 û gelek Astana, Sûtşî û civînên bêçare anîn. Li şûna aloziyê çareser bikin, kûrtir û tundtir kirin. Her civîn an lebateke çareseriya aloziya Sûriyê, çi li hundir û çi li derve bû, ji ber nebûna dînamîkên li ser erdê bê encam dima. Îro jî dema ku hegemonya komplowar mecbûrî hêza birêxistinkirî ya hundir dibe ku desteka çareseriyê jê dixwaze, tê wê maneyê ku tûrikê wan ê çareseriyê vala bûye û tiştek ji pencên wan nedihat der. Ji lewra jî fêm kirin ku bê vîna gelan ne çareserî û ne jî aşitî pêkan in. Fena berê, bi itîfaqên bi faşîzm û netew dewlet re nikarin li derveyî îradeya gelan ti yapiyekê ava bikin. Berjewendî û kirîza hebûn û tinebûna ku jiyan dikin ew tûşî lihevkirina bi gelan re kirine. Nexwe ti hêzeke wan a çareseriyê nîne. Eger îro nûnerên gelan tên vexwendin, ji ber hêza wan e. Di heman demê de ji ber bêçareya hêzên hegemon e ku fena stûdirêjan paşiya wan rût maye.